Newroz Hejmar(67) Rûpel (10) Nîsan 2006z – 2618k

Newroza Şamê

Peyamêrê Nerozê

Newroz li Şamê1956-1957

Newroz li Şamê, ji zû ve destpêkirî ye, berî hemî hermên kurdên Sûriyê, di sala 1956-1957an, komek ji zanayar û xwendekarên kurd li şamê Piraniya wan (ji kurdistana Iraqê bûn) Newroza xwe, li suruşta bajarê Zebedanî (nêzîkî Şamê 60km) pîrozkirin, yên nas di nav wan de, Dr: Nûredîn Zaza, Osman Sebrî, Qedrî Cemîl Paşa, Qedrî Can, Îsmet Şerîf Wanlî, Cemşîd Celadtet Bedirxan, Remo Hiso, Mihemed Zilfo, Umer Dezeyî, Ezedîn Mustefa Resol, Û Umer .....

Newroz li Şamê

2618/2706K - 2006 Z

Îsal jî Kurdên li Şamê dijîn wek hersal ji sibehê zû ve, dest bi çûna hawîrdora Şamê kiribûn, bi taybetî, cihên ko komikên filiklorî li hebin, wek Rokindîn Feyhaa (**koma PYD**) , Hey Tişrin komik lê pirbûn wek **Erxewan**, **Azadî** her yek bi tena xwe, û koma **Azadî** , **Nûhilat**, **Zagros**, hersê bi hevre bûn û li Dîmasê koma **Hilat** û **Newroz**.

Di kat 70.30 an de, hersê komkên filiklorî Azadî, Nûhilat, Zagros dest bi meşa xwe kiribûn û ji Rukinldîn ta cihê Newrozê li Hey Tişrîn, bi hevre meşiyan û di katjimêr 10 û 10 deqan de dest bi ahengên xwe kiribûn.

Destpêkê hersê kom bi hevre derketin ser depa şanoyê , bi yek dengî sirûda nîştmanî kurd Ay reqîb bi hevre strandin.

Koma yekê Azadî bû , ya didwan Nûhilat Û ya sisyan Zagros bû. Hersiyan di demên xwe de, pirograma xwe meşandin û dengbêjan stranên xwe stran û govendvanan govendên rengareng pêşkêş kirin, dilê keç û xortan pîr û kalan zarok û mendalan şa û geşkirin.

Newroz bi gelemperî xweş boriya, cilên filiklorî yên zarok û keçan, surişta buhara rengîn dixemilandin û geşdikirin, divê sala bê hemî keç û xortên me tevî zarokan, cilên xwe yên kurdî li xwekin/wergirn ta newroza me geştir û şêrîntir bikin.

Îsal cihê newrozê hinekî teng bû, milletê kurd bi coşekî mezin li newroza xwe xwedî derdikeve; ji ber avakirnên malên nuh cih newrozvanan û mêvanên wan yên Biyanî gelekî tengtirbû, lê wek kurd dibêjin (cih ji dilan tenge) serjimara newrzvanan nayê jimartin lê bi10 hezaran bûn.